

Newrozeke
bêhempa ji bo Ro-
jhilat

»»» R:7



Mîstefa Hicrî: Emê
hêz û şîyanên xwe li-
hev girê bidin û xwe
ji guhertinan re amade
bikin

»»» R:3




Agirî

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (370) 21-03-2020 Buha (1000) Tûmen

Vîrûsa Korona
çima bi qazancê
rejîmê ye

»»» R:4



Nabe
bêhêvî bin

»»» R:6



EMÊ MALÊN XWE BIKINE AGIRGEHA NEWROZÊ

Newroz, her ji dema berê ve, bo Kurd nûbûna xweza û derfetekê bûye bo berengariya deşthilata narewa a hakim, ku xweştine zilma xwe berdewam bikin.

Di wan salên dawiyê de, careke din newroz bûye pêngavek bo berengarî û xebat li dijî dagîrkeran. Ew pêngav jî peyama rabûna şoreşê li dijî dîktatorên hakim e, ku bi Rasanê hatiye binavkirin.

Newroz û Rasan di çimayiya xwe de, digîjin hevdu, û wateyê didin jiyankirin û zindîbûnê, û di serdem û dîrokê de tevî yektir bûne. Di newrozê de bû, ku peyama geşkirina xebatê bi gelê Kurd hate dan, û hawara êdî bes e “jiyana jêrdeştî û stûxwarî” careke din bû deştêpêka rabûna gelekê, ku hêjayî azadî û rizgariyê ye.

Di newrozê de bû ku hawara “Şoreş erkê me hemûyan e”, dibe çiya bo piştewaniya bajar bihêztir be, bajar jî dibe rabe ser xwe, da ku dujmin nekare derbê li çiya bide; dujmin hejand, û dayîka şehîdên welat, şad kir; “Girêdana xebata çiya û bajar” bû formoleke pêşketî da ku hêviyê

di dilê gel de raçîne, û di newrozê de bû ku bajar axabaniya çiya avête stûyê xwe, da ku bi hev re bibin sembola xebateke pêşketî û hêvîbexş, lewma jî newroz û dîlan, wiha têkilî doza rewa ya me bûn, ku her newrozek dikare me pêngavekê li roja serbestiyê nêzik bike.

Newroza îsal cudahiyek digel nerozên din heye; Newroza îsal xelkeke zêde li derdorên yektir kom nabin, bo dîlankirinê, belkî newroza bi dil digel



azar û xem û xweşiyên yektirbûnê ye. Newroza îsal ku li jêr du siyên nexweşiya Korona û hikmê narewa e Komara Îslamî de rengeke din bi xwe ve girtiye, hewcehî bi bilindragirtineke taybet heye.

Lê tevî wê cudahiyê jî, di cewherê berengarî û

berxwedaniya rewa a newrozê de, tişteke nehatiye guherîn, û di wê newrozê de, tevî berengarî di hember Komara Îslamî a Îranê de, dibe em di hember nexweşiyên kêmkarî û dijayetiya bizanebûn a komara Îslamî jî bisekinin.

Her di vê newrozê de jî, bi bicihgihandina hemû rênimayiyên tendirustî yên hewce, berengarî rejîmê bibin, da ku nexweşiya Koronayê şikest bidin, û bi şekêtdana wê nexweşiyê, dagîrker xembar bikin, ku nekariye zirar û ziyanên zêdetir bigihîne me, û piştî Koronayê jî, bi ser Komara Îslamî de serbikevin.

Ji demên berê ve heya niha, herçiqas zilma zaliman zêdetir bûye, Kurd ji bo şikestêdana wê qahîmtir bûye, û di demê de ber bi newrozê ve diçin ku nexweşiya Koronayê bi sedema kêmkariya bizanebûn a rejîmê di welat de belav bûye, çimkî wisa dizane ku kuştina xelkê bo heyamekê be jî, ji hemû wan xwenîşandan û nerizayetiyan dûr dibe; lê nîştiman û xelk û nemaze xortên çalak li çarçoveya rêkxistinên nehikumî û xelkê xwebexş li Kurdistanê, wate “Parêzvanên Jiyanê”, wekî pêşmerge ji Kurdistanê xwedî derketin, û bi kêmtirîn îmkanat, lê bi îradeyeke bihêz li dijî Koronayê sekînin, da ku ziyanên kêmkarî bibin, û rejîmê jî li kêmbûna ziyanan tûre bikin. Heştayek girtî a xelkê wekî hertimî bûye mertala berengarî û paraştina bajar, her ew heşt e ku, berfireh dibe, û îro Korona û sibê jî Komara Îslamî davêjin nav kirsdanka dîrokê de.

Di wê newrozê de, emê wekî gurrka agir di newrozê de, bi xebatkirin li dijî dîktator û pîlanên wê rabin ser xwe, û di hember vîrûs û nexweşiyên de, emê berevaniyê ji xwe bikin. Emê bi ceste ji yek dûr in, lê bi dil, digel yektir in, û bo yek armanî jî, hewl didin. Em e Kurd rûniştîyê welatê Rojê, û nîfşên Mîdyayê ne, û gelek dîktator û nexweşî û bela tên, lê namînin, û ewên ku dimînin, Kurd û Kurdistan in, ku hertimî û di her newrozekê de, kulîlkan didin, heya ku negihîjin rizgariyê, nikarin bisekinin; Eva ew ketwar (waqî`i) a rastî ye, ku dibe em bizanin, rastîyek ku vîrûsa Komara Îslamî bi salan e, jê tirsîyaye, û berdewam hewl dide, li dijî wê bisekine. Ku wisa ye, pîroz be newroza Parêzvanên Jiyanê.

Sergotar

Sala Mirinê

N: Kerîm Perwîzî

Em ji rojên dawiyê yên sala 1398'an derbas bûn, û pêka rewta asayî a jiyanê, xelk dibe di rojên dawiyê yên salê de, dilxweş bin ku sal, dawî pê tê û rêûresmên newrozê û sala nû bi rê ve dibin. Hemû salekê ew rojên dawîya salê, rojên xwe amadekirin bo pêşwazî ji sala nû bûye û civatgeh û malbat herketek têde hebûye, ku ber bi nûbûna jiyanê û nûbûna pêwendiyên xwe ve herin.

Lê çend salek e ku rejîma Komara Îslamî a Îranê xweşî û dîlan ji xelkê bêpar kiriye, û li wan kiriye jehreke tal. Bi salan e ku ew rejîma dirinde, ji tîrsa dîlana xelkê, rojên dawîya salê kiriye bi manorên hêzên xwe, û tirsandina xelkê, û bi vî awayî pêşî ji kombûn û rêûresmên bikom girtiye, çimkî kerbê wê ji hemû cure kombûn û dîlanekê digre. Zêdebarê wê jî, ku bi siyaseta xwe a gendelkarî û talankarî ve, sal digel salê, jiyan xelkê girantir dike, û rojên dawîya salê, xelk tenê dilxweşiya nûbûna salê bo wan dima, belkî heya ku dihat sifra wan biçûktir û berîkên wan valatir û hestretên dabînkirina hêviyên zarokên wan girantir dibû. Tevî wan hemûyan jî, dîsan hindêk dilxweşî bo nûbûna salê û newrozê di dilê xelkê de mabû, ku îsal wê rejîma dijemirov ew jî, ji wan dizî. Êdî nûbûna salê, ti watayekê nade bo wan neteweyên ku di Îranê de bûn bi barimte, û êxsîrê destê rejîma Wîlayeta Feqîh.

Belaya Korona ku bi destê Ayetûlaha hate Îranê, û di nav hemû welat de belav kirin, xweşiya jiyanê li civatgehê biriye, û pêşwaziya sala nû li xelkê kiriye şîna jîdestdan û azarkêşana ezîzen xwe. Di wê salê de, Korona dawî

Dezgeha Ragihandina Giştî a PDKÎ pîrozbahî li xelkê Kurdistanê kir



Bi hilkefta cejna Newroz a Kurdewarî, Dezgeha Ragihandina Giştî a PDKÎ, pîrozbahî li xelkê tekoşer ê Kurdistanê kir.

Di wê pîrozbahiyê de, Endamên Dezgeha Ragihandin a Partiya Dermokrat a Kurdistanê Îranê, mandînebûnê dibêje hemû xelkê Kurdistanê ku di wan rojan de li wê rewşa Kurdistanê li encama nexweşiya Koronayê, di rewşeke dijwar de ye, xelkê Kurdistanê bi awayekî xwebexiş bo tendurîstiya xelkê bê ravestandin kar dîkin.

Hevdem, Dezgeha Ragihandin a PDKÎ, spasiya xelkê xebatkar ê Kurdistanê dike ku yekgirtî û yekdeng bona pêşgirtin ji belavbûna vîrûsa Koronayê di gund û bajarên Kurdistanê de paqij dîkin.

Dezgeha Ragihandin a Partiya Dermokrat a Kurdistanê Îranê, bi boneya Newroza Kurdevarî, spasiyeke taybeyt û destxweşiya ji “Parêzerên Jiyan”ê dike ku bi avakirina kempênên taybet, bi hawara xelkê ve diçin û alîkariya xelkê dîkin.

Bi navê Dezgeha Ragihandina Partiya Dermokrat a Kurdistanê Îranê, dîsa pîrozbahiyê li hemû xelkê Kurdistanê dîkin ku di wan rojan de ku nexweşiya Koronayê di Kurdistanê de belavbûye, bona parastina gel û welatê xwe ji ti karekî xwe neparastin û erkê netewiyê xwe bi cih gihandin.

Asoya azadiye geşe, hîvîdarin ku îsal, sala serketin bi ser rejîma Îslamiya Îranê de be û şahidê nemana rejîma Îranê bin.

bela bû ku wê rejîmê wekî diyarî bo neteweyan anî, û pêş wê jî, bi mûşek balafireke medenî kire armanc, û xiste xwarê, ku qerer bû toleya kuştina Qasim Silêmanî yê terorîst li Amerîkayê hilde, lê daxa xwe li ser xelkê Îranê de rijand.

Pêş vî yekê jî di Xezelwerê de sedan kes di seranserê Îranê de kuşt, û bi hezaran kes birîndar kir, û dehan hezar jî binçav kir.

Sala 1398'an, bi siloganên bê bingehe yên Welîyê Feqîh dest pê kir, û heya dihat ew bi serberedayiya navkî ya wan zêde dibû, û digel bank û sîstemên cîhanî pîrsgirêkên zêde diafirandin. Di nav Îranê de jî roj li pey roj serkut û kuştar zêde dîkir.

Sala 1398'an, saleke tijî ji mirin û belengazî bo neteweyên Îranê bû, û di wê sala mirinê de, hezaran malbat ji Kurd û Turk, Fars, Erebb, Belûç û Turkemen daxdar bûn, û bi Koronayê ve salê nû dîkin, û kopka azarên Koronayê maye bo sala bê. Gel hêvîdar in ku digel kopka Koronayê, rejîm jî ber bi sernîşîvî û kûrahiya dola nemanê ve here, çimkî her roj zêdetir mana rejîma Wîlayeta Feqîh, mirineke nû bo xelkê tene.

Bi hêviya nemana çavkaniya belengaziyan di sala 1399'an de.

Mîstefa Hicrî: Emê hêz û şîyanên xwe lihev girê bidin û xwe ji guhertinan re amade bikin

Mîstefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bi helkefta sala nû a Rojî peyamek belav kir. Wî di peyamê de pîrozbahî li xelkê Kurdiştanê kir û got ku civaka Îran û Rojhilat di nîgeraniyê de û bi hin pirs-girêkan re derbas dîkin û bi vê rewşê diçin pêşwaziya sala nû. Newroz ji bo me tê wateya rabûn û rasanekê dubare û hêmaya yekbûnê ye.

Peyam wiha ye:

Welatîyên hêja!

Xelkê azadîxwaz û xebatkar ê Rojhilat!

Di rewşa niha a Îranê de ezmûna dehan salan a kirîzan tê ber çavên me û tê bîra me ku ev rejîm di bingeha xwe de li ser kirîzan hatiye avakirin. Di van salan de, vê desthilatê, xwe bi ser civakê de ferz kiriye û lewma jî civakê, hevsengiya xwe ji dest daye û jiyan gihaye asta mirinê. Jiyan û kerameta mirovan tene bêbihakirin. Li wir daxwaza azadî û mafxwaziyê hatiye tepisandin. Kirîzên li pey hev, hem jiyana xelkê navxwe ê Îranê asteng kirine û hem jî sînorên vî welatî derbas kirine.

Bûyerên sala derbasbûyî balkêş in. Eger em şîpela xurt a xwepêşandanên meha Xezelwer binirxînin, xuya dibe ku van bûyeran, berî her tiştî raştiyek nîşanî cîhana dervey Îranê da; Ew jî ev e ku rejîma Îslamî a Îranê bi hemû pêkhateyên xwe ve di kirîz û binbestê de ye. Dengê kolanan û xwîna bi hezaran qurbanî, girtî û wan kesan ku di van bûyeran de hatin binçavkirin û hîn çarenivîsa wan nediya e, rûyê rastîn ê van bûyeran bû. Civaka Îranê û bi taybetî jî neteweyên bindest ku zêdetirîn qurbanî dane, bi kiryarên xwe selmandine ku ji bo derbasbûn ji vê rejîmê û ji bo têkbirina bingehe û vê desthilatê amade ne û ew di fikra qonaxa piştî Komra Îslamî a Îranê de ne.

Bûyereke din ku bala mirov dikşîne, şanoya dengdan angû hilbijartinên gerra yazde a Meclîsa rejîmê bû. Vê carê ne tenê li kolanan, lê belê li nav malan, li dervey navendên dengdanê û li her derî dengê baykot û şepêla NA dihat dîtin. Vê şepêlê careke din bingeha desthilatdariya rejîmê hejand û li ser şanoya siyasî a Îranê hate tomarkirin. Ev dengê dijber, şikesteke mezin bû ji bo serkirdeyên rejîmê û şexsê Elî Xamineyî ku li ber xelkê digeriya û lahî dîkirin ku herin ser sindûqên dengdanê û şanoya hilbijartinan bixemlînin.

Lê belê bi van şepêlên nerazîtî û bi gotina NA, me hin bûyerên din dîtin ku kirîza rêveberî û nebûna şiyana berpirsên rejîmê nîşan didin. Hin mînakên din jî ev in; Rabûna lehiyê li piraniya parêzgehên vî welatî, bûyerên wek erdheja Kotolê û vê dawiyê jî berfirehbûna vîrûsa Corona û nebûna şiyana saziyên dewletê ji bo kontrolkirina vê vîrûsê û xizmeta qurbanî û berketiyên wê.

Van bûyeran zêdetirî berê, kûrahiya kirîza desthilatdariya tijî karesat a rejîmê nîşan dan. Derbasiya jiyana xelkê li Îranê ji ber kirîzên pîralî ên navxwe û derve raştî astengiyan hatiye. Bi taybet jî hevpeymanîya Amerîkayê ji bo danîna givaşên zêdetir li ser rejîmê ku encama siyasîsetên gemar û şaş ên rejîmê ne. Di encamê de jî civak û rejîm jî tûşî pîrsgirêkan dibin. Tevî van pîrsgirêkan, kirîzên civakî, abûrî, siyasî, çandî, jîngeyî, rêveberî û kirîzên din ku dehan û sedan pîrgirêkên din li pey xwe ve anîne, bûne beşeke jiyana asayî a xelkê li vî welatî. Tepisandina sîstematîk, siyaseta fermî û hertimî a desthilatê ye. Ew jî bi vî rengî ye ku rejîmê, ewlehiya xwe li têkdana ewlehiya civakê û tepisandina hizrên cuda girê dane. Rewşa ku niha li Îranê tê dîtin, bi heman şeweyî li dervey sînorên vî welatî

jî reng vedaye. Ev hevpeymanî û hevbendiyên ku li dijî rejîmê tene pêkanîn, amajeyên vê raştiyê ne. Dengê nerazîtîya xelkê li kolanan Îraq û Lubnanê li dijî Komara Îslamî, vê siyasîsetê reng vedidin.

Welatîyên xweştirî

Ji bo me Kurdan, rengê Komara Îslamî a Îranê reş e. Rejîm, her roj zêdetir raştî kirîzên navxwe û derve tê û me jî di vê navberê de ezmûneke dirêj a xebat û berxwedanê li hemberî vê rejîmê heye. Bi vê xebat û qurbanîdana dehan salan li dijî tarîtiyê ji bo rizgariya netewî, her roj hêviya hevxebatî û hevçarenivîsiya me zêdetir û geştir dibe. Di heyama sala derbasbûyî de hem weke partiyên Kurdiştanê ên Navenda Hevkariyê û hem jî weke pêkhateyên civaka Rojhilat, lihevgîştin û berpirsyariya hevpar çê bûye û bi vî rengî jî me qonaxeke bi nirx ji hevdengî û hevrêziyê, daye tomarkirin. Hemû pêkhateyên Kurdan li Rojhilat, li hemberî van bûyerên siyasî û siruştî ku çê bûn, ji şanoya hilbijartinan heya erdheja Kotolê, heşt bi berpirsyariyê kirin û kiryarên wan jî bi heman şeweyî bûn. Heşt berpirsyaretî bi hevçarenivîsiyê, xebata hemû bajarên lihev girê dide û ruhê bihevrebûn û hevçarenivîsiyê li nava bajar û navçeyên cuda ên Kurdiştanê çê kiriye. Alîkariya xelkê navçeyên cuda ji bo berketiyên erdheja Kotolê û berî wê jî alîkariya xelkê bo berketiyên lehî û erdheja başûrê Zagrosê, wêneyekî xweşik ji heşt nîştimanperwerî û mirovdostî a civaka Rojhilat nîşan da. Ev qonax jî, bê guman semyaneke siyasî p destkefteke girîng bû ji bo netewa me.

Em bi erkê siyasî, exlaqî û netewî ê hemû aliyan dizanin ku li ser vê rêbazê berdewam bin û tevî cudahiyên di navbera me de, ji bo berjewendiya netewî û pêşeroja netewa xwe berpirsyar bin.

Bê guman riya serkeftinê, ji yekvrêzî û gotareke xurt û netewî re derbas dibe û divê di vê pêxemê de hemû alî, li gorî şîyan û derfetan, erkên xebatê bicî bikin. Divê hêz, şîyan û semyana şoreşgêriyê lihev girê bidin û xwe ji bo guhertinan amade bikin. Çawan jî be, êdî Îran û ev navçe, navenda wan guhertinan e ku nedihatîn pêşbînîkirin. Lewma jî pêwîstîyeke dîrokî ye ku em bi dîtingeha nasnameya netewî û berjewendiyên netewî, rewşa niha û pêşerojê piştî guhertinan binirxînin û li dijî desthilata dagirkar derkevin.

Tevî ku sala derbasbûyî ji bo dujminê me sala şikest, têkçûn û sivikbûnê bû, ji bo neteweyên Îranê saleke bê destkeft nebû. Di vê rewşê de civaka Îranê û Rojhilat jî bi nîgeranî û tevî gelek pîrsgirêkan diçin pêşwaziya sala nû. Zêdebarî vê, Newroz ji bo me tê wateya rabûn û rasanekê din. Herwisa hêmaya yekbûnê ye. Lewma jî em bi dilekî tijî hêvî, diçin pêşwaziya sala nû û qonaxa nû a xebatê. Di vê rêbazê de emê gavên xwe û rêzên xwe jî xurt bikin.

Em helkefta sersala nû, pîrozbahiyê li gelê Kurd li hemû beşan û bi taybet li xelkê Kurdiştana Rojhilat û di serî de pîrozbahiyê li malbatên şehîdan, girtiyên siyasî û tevahiya endam, kadr û pêşmergeyên bajar û çiya dîkin û bejna xwe li hemberî rêz û wefadariya wan ji bo şehîdan û rêbaza tijî serwerî a wan ditewînin. Di vê helkefta netewî de em careke din sozê didin ku heya dabînkirina armanca azadî û rizgariyê, roj û sal û derfetan bikin pêgeha hevxebatî û berxwedanê.

Newroz li we pîroz be.

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê
Lêpirsyarê giştî
Mîstefa Hicrî

Newroza 2720an a Kurdî


Vîrûsa Korona çima bi qazancê rejîmê ye?



N: Dara Natiq

Di destpêka serîhildana “Coronavirus disease” (COVID-19) li welatê Çînê, cîhan bi giştî ew nesaxiya han bi xeterek mezin li ser jiyana mirovahiye bi nav kirin, û ragehandin ku dibe bi avayekî micid ji bo pêşgirtin ji belavbûna vê belaya han, ku dikare canê milyonan însan biştîne, gavên micid û pîlanên mezin û berfireh werin danîn.

Piraniya welatan her di destpêka vê nesaxiyê li welatê Çînê, pêwendiyên xwe yên hatûçûyînê bi wî welatî re qut kirin, û agahî û hişyarî dane hemwelatîyên xwe, ku tu kes seredana wî welatî neke, û rêyên xwe yên esmanî û yên erdê bi Çînê re qut kirin. Û herwisa bi awayekî berfireh rênimayî û agehiyên tendroştî ji bo xwe parastin ji vîrûsa han dane hemwelatîyên xwe û tedabîrên hewce ji bo pêşî girtin ji vê belaya malwêranker girtine pêş. Lê mixabin rejîma Îranê bêtê guhdan bi vê bela û xetera mezin bo ser canê însanan û bêtê ku saxlemî û jiyana gelên Îranê bo girîng bibe û berevajî raya giştî ya cîhanê, rêyên hatûçûyînê a esmanî û erdê bi ser welatê Çînê de, vekirî hêla, û şirketa balafir a Mahan, ku ser bi Spaha pasdaran e, berdewam di rojê de çend caran di navbera Îran û Çînê de hatûçûyîn dikir, heya ku bûn sedemê veguhestina Coronavirus disease (COVID-19), ji Îranê û bi hezaran kes ji xelkê Îranê tûşî vê belayê kirin, û heya niha xelkek berçav jî bûne qurbanî, û ew yek roj li pey rojê zêde dike,



û rengê mirinê per û balê xwe bi ser wî welatî de kêşaye.

Her di encama vê siyaseta dijîmîrovî a rejîma Îranê de civatgeha wî welatî bi giştî bi xeterek gelek mezin re rû bi rû bûye, û hejmara qurbanîyan her roj zêdetir dibe. Rejîm siyaseta hewce bo kontrolkirin û belavnebûna wê nesaxiyê negirte pêş, û heya mîdehek zor ew nesaxiya han li raya giştî a cîhanê û xelkê wî welatî veşartin. Di raştî de rejîm bi veşartina raştîya vê nesaxiyê di destpêkê de xwaşt ku tu bandorekê li ser beşdarînekirina xelkê li meşa 22' Rêbendanê a salvegera rejîmê çê neke, û dema dît ku êdî xelk bi tu avayî hazir nînin, beşdar bin, wê demê ew nesaxî kire hincet û ew raştîya han eşkere kir.

Lê pirsyar eva ye ku rejîma Îranê çima ew nesaxî û belaya han ji xelkê hejar û belengaz yê wî welatî re bi diyarî anî, û çima bi awayek micid li hember vê nesaxiyê gavên hewce navêje û bo çî ew bajarên ku herî zêde Coronavirus disease (COVID-19) bilav bûyî, heya niha jî nehatine qerentîne kirin. Lê mixabin rejîm bazirganiyê bi mirina xelkê belengaz yê wî welatî dike û ew yek ji xwe re weke xenîmetek dibîne. Rejîm ku niha di bin zext û givaşa dorpêçên abûrî de ye û di encama siyasatên şaş û şerxwazane a wê nîzamê abûriya wî welatî bi tewahî herifiye, û bêkarî û hejarî û nemaze nebûna bûdceya hewce bo îdareya welat, kemera rejîmê şikandine, û ber bi nemanê ve diçe, dixwaze di bi navê harîkarî û bi hewarçûna xelkê Îranê pereyan li cîhanê werbigre. Rayedarên rejîmê heya niha bi merema rûbirûbûna bi Coronavirus disease (COVID-19) re sedan milyar Dîlar pere û harîkariyên pîzîşkî ji welatên Ewropa û herêmî wergirtine. Lê mixabin ew harîkariyane tu car nagihîjin deştê xelkê û hemî ji aliyê Spaha Pasdaran ve deşt bi ser de tînin dayîn, û bi merema dabîn kirina bûdce û alavên tepeserkar yên navendên emniyetî yên rejîmê tînin mifah wergirtin. Ew alavên pîzîşkî ji ku bo wî welatî tînin şandin hemî deşt bi serde digrin û di bazara azad de bi nîrxek herî zêde difroşne xelkê û bazirganiyê pê dîkin. Lewma Coronavirus disease (COVID-19) û herî zêde belav bûna wê di wî welatî de ji rejîmê re derfet û xenîmetek mezine û mirina xelkê bazara wan ya dizî û talanê ger û gurtir dike.

Ji aliyek din we jî rejîm bi hinceta Coronavirus disease (COVID-19), dibêje ku tehrîmên Amrîkayê bo ser wî welatî bûne sebeb ku alav û harîkariyên hewce ji aliyê cîhanê we negihîjne xelkê îranê û di bîngeh de ew tehrîmên Amrîkayê dijî xelkê îranê ne û lazime cîhan zext û givaşan bixe ser Îranê bo rakirina wan tehrîman. Anku merema rejîmê ew e ku bi xolqandina tirajîdiyayek mezin di Îranê de bi hinceta Coronavirus disease (COVID-19), givaşek navdewletî bo ser Amrîkayê çê bike bo wêdedana tehrîman. Coronavirus disease (COVID-19), ji wê rejîmê re xenîmetek din jî li pey bû ku hem komujî û tepeseriya xelkê nerazî yê Îranê di encama meşên nerazîbûnê yên çend heyv berî niha û him jî pîrsa mûşeklêdana balafira misafirberî a Okraniya û berdewamiya meşên nerazî di îranê de bo heyamekî bikewne perawêzê û ew ji xwe bo hikûmet-nîzamiyeke sertaserî û serkuta zêdetir amade bikin.

Hemî ew raştî û gelek pîrsên din jî bûne sebeb, ku rejîma Îranê Coronavirus disease (COVID-19), ji xwe re weke derfet bibîne, û mirin û tûşbûna zêdetir a xelkê bi wê nesaxiya malwêranker xwe re bi xenîmetek mezin bibîne, û bazirganiyê bi jiyana wî xelkê belengaz bike. Ber hindê, ne bajar hatne qerentînekirin, û ne jî gavên micid hatin avêtin bo rûbirûbûna wê nesaxiyê.

Pêşmerge hêz û îradeya gelê Kurd



N: Kamyar Êyvarî

Bi dirêjahiya dîrokê, neteweya Kurd hertim di pêxema aştî û azadî û mafê berheq yê xwe de, xebat kiriye, û şorişên gelek mezin bi rê ve birine, û li hember siyaset û komplo û cinayêta dagîrkerên Kurdistanê bi îradeyek bilind a şoreşvanî sekinîne, û bi serbilindî ve, berxwedan kirine, û cangorîtî û fîdakariya neteweya me îro bûye mijarek girîng a rojeva bas û gengeşeyên raya giştî a cîhanê.

Di pêvajoya xebat û berxwedana dîrokî a gelê Kurd de, pêşmerge xwedîkê û rolek mezin û girîng bûye. Cangorîtî û fîdakariya pêşmerge li hember dujmin û dagîrkerên Kurdistanê de, moralek bilind daye civatgeha Kurdistan û nemaze xurtên mafxwaz yê me, û ew hertim weke îradeya mafxwazane û sembola aştî û azadiyê tîn pênasekirin. Pêşmerge di qonaxên cuda-cuda ên xebata bixwîn ya gelê Kurd de, li hemberî dagîrkerên Kurdistanê de hertim gurzeke hesinîn bûye, û herwisa moraleke bihêz daye xortên gelê Kurd. Xwerağiriya vî mirovê cangorî, bûye sedema vê ku ew bibe kesayetiyeke naskirî, û hez-kirî bo gelê xwe, û ji aliyekî din ve jî bibe cihê hêviyê bo domandina xebata rewşa ya gelê xwe.

Nav, armanc û peyama azadî û aştîxwaziya pêşmerge, hertim bûye sedema tirs û xofek mezin di nava dilê dagîrkerên Kurdisatê û dijminên azadî û wekhevî û mirovatîyê. Dîroka berxwedan û serboriya



neteweya Kurd ew yeke daye xuyakirin ku, heya zulm û zordarî û dagîrkarî bi ser Kurdistanê de bimeşe, xebat, berxwedan û cangorîtiya pêşmerge weke sembola azadî û paraştina keramet û nasnameya neteweya Kurd yê hertim berdewam be.

Pêşmerge berhema hizr û ramana PDK Îranê ye û di nava qatên civaka Kurdistanê de xwedî pêgehek cihgirtî ye. Şer û xebata Pêşmerge li hember dagîrkarî û terorîzm û tundajoyiya herêmî, nasname û giraniyek cîhanî daye heybet û felsefeya azadîxwaziya Pêşmerge, û di navendên xwedîbiryar ên dunyayê de, weke peyamnêr û xebatkarên aştî û azadî û wekhevîyê tîn binavkirin, û xelat bi wan tîne bexşîn. Pêşmerge ew remz û sembola pîroz ya gelê Kurd e ku şoreşa modern û azadîxwazane ya gelê Kurd bi pêngavên cesûrane û îradeya polayîn ya xwe ber bi pêşve biriye, û lehengî û tekoşîna bê rawestîyan di pêxema man û hebûna gelê Kurd de ji xwe nîşan daye.

Bo hemû aliyekê êşkere bûye, ku pêşmerge di her çeper û her biyaveke bergiriyê de, ku alîkarê vê xebata rewşa be, xizmet kiriye, û ji bextkirina can û mal û tendirustî û jiyana xweş, û ji tu cure fîdakariyekê xemsarî nekiriye. Pêşmerge ev şoreşvanên ku bi bîr û bawer, hizir û zanî û karîna xwe ji bo parêzgarî kirin ji ax û neteweya xwe xebat dikin û can ji serdest amadeyî hemî fîdakariyekî ne. Bi çeka xwe û bi pênûsa xwe li hember dujmin û dagîrkerên Kurdistanê disekin û xebata xwe bi girseyî dimeşînin.

Pêşmerge qehriman yê Kurdistanê, di serdemê damezrandina yekemîn dewleta moderin a Kurdistanê û li ser destê pêşewayê mezin yê Kurd Qazî Mihemed, û piştî damezrandina hêza neteweyî a Kurdistanê, erkê vê hêzê parêzvanî ji Kurdistanê bû. Kurdan ji berê ve navê pîroz yê pêşmerge bo mirovên netirs û cangorî bikar birine. Ji wê roja ku navê pêşmerge li wêjeya şoreşgêrane a gelê me de bû kultûr, nasname, sembola xwerağirî û cangorîtiyê, pêşmerge bû bi baskê bihêz yê gel.

Pêşmerge bi îrada polaîn û berxudariya bêmînak a xwe hebûn û mana neteweya Kurd destber kiriye û di paşerojê de jî, hêvî û mana neteweya Kurd wê misoger bike. Şehîd Dr. Qasimloyê rêber dibêje: Pêşmerge ew zarokên biwefayê gel in ku hemû saman û jiyana xwe bi camêrî di xizmeta armancên netewa xwe bi kar tîne bêtî ku di vî riyê de heqdest yan xelatekî werbigire. Em li hember mezinahî û fîdakariya pêşmerge de bejna xwe ditevînin, û ew îrade û milê biqawet yê neteweya me ne.

Nabe bêhêvî bin



N: Nûredîn Sofîzade

Newroz û sala nû pîroz be û bi hêviya rojên xweş û azad û dûr ji hemî derd û bela û nexweşiyekê bo gelê Kurd. Îsal di demekê de em çûne nav sala nû a Kurdî û me cejna newrozê derbas kir ku mixabin cîhan û dever û Îran û Kurdistanê di nav gelek diwariyê de ne.

Mixabin me sala kevin di demekê de pişt serê xwe ve hêla ku hêşta jî dîktatoriya Wilayeta Feqîh di Îranê de xwîna xelkê Îranê dimije. Sala derbasbûyî bo xelkê Îranê û bi taybet bo gelê me yê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, bi rojreşî û bi hebûna dehan arîşe û talî, ç[ne nav sala nû.

Gelê me di demekê de pê avête nava sala nû ku tevî zilm û zor û nebûna azadî û bêmafîyê, bê karî û giranî, girtin û kuştin û asîmilasyoneke tund hember bû.

Rejîma deşhilatdar a Îslamî li dijî hemû dengekeke mafxwazî disekîne û bi awayê hovane di cehda tepeseriyê de ye, û rojane sîngê xortên kurd yê kolber dike armanca gullan û dîkujê. Niha jî xwîna xortên Kurd tevî xwîna hezaran Îraniyan ku payîza derbasbûyî bi fermana celladê Wilayetê ku hate rijandin, hêşta hişik nebûye.

Niha jî kolanên bajarên Kurdistanê wekî Ciwanro, Merîwan, Seqiz, Bikanî û Kirmaşanê bêhna xwîna xortên Kurd jê tê. Niha jî qedera sedan xortên Kurd tevî hezaran xortên Îranê ku di meha Xezelwera



derbasbûyî de hatine girtin, ne xuyaye.

Niha jî cenazê sedan û belkî hezaran qurbaniyan nedane malbatên wan. Rejîma dîktator baş dizane hekî rewş tena be, hekî xelkê derfeta hizrînê hebin, bê guman dê di yekemîn derfetê de, text û bextê wê rejîmê sernixûn bikin û tola wan hemû xwîn û sîtema 41 salên derbasbûyî dê jê bişînin.

Her lewmaye ku deşhilatdarên rejîmê bi mebesta kuştin û bédengkirina xelkê bêzarbûyî yê Îranê, digel vîrûsa Koronayê deşt dane deştê hev ku rewşeke wisa bîafîrîn da ku ti kes hêza derketin û eyana nerizayetiye çinebe.

Eve bû ku dîktatoriya deşhilatdar di hember hatin û belavbûna Koronayê de ne tenê berahîk jê negirtin, beklî bona tûşbûna xelkê Îranê bi wê vîrûsê, ew nesaxî bo xwe wekî nê`imet hesibandin. Rejîmê bi bizanebûnî Korona anî Îranê û belav kir. Di demekê de ku hemû cîhanê digot Korona di Îranê de heye, rejîm kevte înkâr kirinê da ku vîrûs bigîje hemû derên Îranê.

Rejîmê bona wê ku xelk di şanoya hîlbijartina meclîsê û rêpîvana 22`ê Rêbendanê de beşdar be, perde kêşa ser raştiya hebûna vîrûsê.

Lê heya kengê? Pirsyar ev e ku ma dê Korona heta heta dê bimîne?

Xelkê Îranê û bi taybetî gelê Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de, her hemen ev xelke ye ku astê bêzariya wan ji wê rejîmê çend qat zêdetir dibe.

Bêguman xebat û berxwedan û xwenîşandan serhev dipangure heya hêz û şiyana xwe bêxe serhev bo rûbirûbûna tevî wê rejîmê di sala 1399`an de.

Hişyariya xelkê, mafxwaziya xelkê Îranê, êdî di asteke wisa de nine ku rejîm wisa bizane bi tîşbûnkirina xelkê bi nesaxiyê, bikare xwe ji sernixûniyê rizgar bike.

Xebata yekgirtî ya gelê Kurd jî, bêguman ji hemû demên derbasbûyî xorttir e, û berdeyam e û hêzên siyasî û xelk îro rojê yekdeng in û xwe amade kirine bona xebateke rijd, da ku maf û kirameta netewî ya xwe bideşt bînin.

Ew armance jî di demekê de dê bi deşt ve bê û hasil be ku rejîma dîktator bi yekcarî sernixûn be.

Bi armanca serkevtinê û xebat kirin bo sernixûniya kela zilm û zordariyê jî, hewceye xelkê Îranê bi giştî û gelê me yê Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de, xwe amade bikin, xwe rêxistinî bikin û rênimayiyên xweparastinê berçav bigrin, da ku tûşê vîrûsa Koronayê nebin, da ku sala 1399`an bikine sala xelasiyê û paqij kirina herçî vîrûsekê û bi taybetî vîrûsa ku 41 sal e pêsîra xelkê Îranê girtiye.

Hekî sala derbasbûyî saleke pir ji rojreşî bû, bila xelkê Îranê bêhêvî nebin, bêguman ronahiya azadiyê xuya dike û îsal an ku 1399`an, dê bibe sala gihîştin bi azadiyê û dûr ji dîktatoriye.

Nerîna Lîderan



Mîstefa Hicrî:

“Emê hêz û şîyanên xwe lihev girê bidin û xwe ji guhertinan re amade bikin”.



Donald Trump:

“Îraniyên netirs sala derbasbûyî li dijî gendeliya hikûmetê xwenîşandan kirin”.



Justin Trudeau:

“Em pîrozbahiya cejna newrozê li xelkê Kurdistanê dikin û hêviya serketin û bexteweriyê bo netewa Kurd dixwazin”.



Hesen Rûhanî:

“Me tiştek bi navê qerentînekirina bajaran nîne”.

Newrozeke bêhempa ji bo Rojhilat



N: Eskender Ceiferî

Komara Îslamî a Îranê, tevgera partiyên Kurdistanê Rojhilat bi hûrî dişopîne. Her dema ku partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, dilê Komara Îslamî jî nîgeran e. Vê carê ew hem li dijî Corona bûne yek û hem jî dixwazin hêzên Pêşmerge bikin hevdeng û yekbiryar.

Newroz, sembola Kurdan e. Bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan desthilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine merasîma Newrozê bi rengekî ciddî were pêşwazîkirin.

Kurdistanê Rojhilat jî parek ji vî welatê birîndar e. Rejîma Komara Îslamî jî weke rejîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike.

Lehengên Kurdan bi dehan salan li girtîgehên dimînin. Beşek ji wan tenê eger ji Elî Xamineyî rêberê rejîma Komara Îslamî re daxwaza lêbûrînê binivîsin, wê bêne berdan.

Li Îranê hin xalên yasaya bingehîn behsa serdana malbatê ji bo girtiyan di Newrozê de dikin. Lê girtiyan siyasî, wan xalan lixwe nagirin û nikarin Newrozê herin serdana malbatên xwe. Gelek ji girtiyan Kurd bi tometa şerê li dijî Xwedê bi darvekirin, girtina sermedî (hertimî) û hin jî bi dehan salan girtîgehê hatine sizakirin. Kesê ku bi tometa endametî di yek ji partiyên Kurdî de hatibe girtin, hertim fikra rewşên bi vî rengî dijwar û giran ji xwe re dike. Li gor benda duyem ya



Danezana Cîhanî a Mafên Mirovan, her kesek bêtî ku duçarî cudahiya ji ber nîjad, reng, zayend, ziman, ol, baweriya siyasî yan jî yeke din jêbûna neteweyî an jî civakî, saman (serwet), zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sûdwergirtina ji hemû maf û azadiyan ên ku di wê Danezanê de hatine ragihandin. Xala herî balkêş ev e ku divê ji ber statuya siyasî, hiqûqî an jî ya navneteweyî di navbera mirovan de cudayî neyê kirin; te divê ev welat an herêm serbixwe an jî te divê ne xweser an jî te divê ne xweser an jî di bin rajêriya tahdîda serweriyekê de be. Lê kîjan Kurd e li Rojhilat ku ew maf standibin û dîsa jî şer bike!

Aliyên siyasî ên Rojhilat, herî dawî li ser mijara Corona û pêşwazîkirina hevpar li Newrozê lihev hatin. Belkî ev zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji Ber ku niha hemû partiyên nasyonalîst û komonîst yê Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzik bûne.

Tevger û riftarên Îranê li hemberî Kurdan, piraniya xalên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan ya ku ji aliye Neteweyên Yekbûyî ve derketiye, bînpê dike. Ew danezan di 10'ê berfanbara 1948'an de hatiye pejirandin. Danezan han bû belgeyeke bingehîn ji bo tekoşîna mafên mirovan di hemû cîhan de. Lê li gora dekomet û belgeyan, hikûmetên weke Îranê qet guh nedan xalên wê. Komara Îslamî jî bêkar nerûniştiye

Piştî biryara han ya pêşwaziya hevpar li Newrozê ji aliyê partiyên Kurdî ve, tevgera bihêz di nava Sipaha Pasdaranê Îranê de çê bûye. Ew ditirsîn vê carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyariyên veşartî li nava Sipayê amaje dikin ku bajarên Sine, Ormiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke a hêzên vî rêxistinê. Li gor zanyariyên çavkaniyeke veşartî a saziya Îstixbarat angû Îtîlaata Îranê, eger tevlihevî yan jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî desthilatê çê be, dibe ku mifah ji aliyên selefî jî were standin ji bo dijatiya hêza Kurdan.

Aliyên siyasî ên Rojhilat di çil salên derbasbûyî de nîşan dane ku li gor wan, rejîm ti guhertinekê qebûl nake. Ew alî wisa dibînin ku qet li Îrana di bin desthilata Komara Îslamî de, hîlbijartineke demokrat û azad birêve neçûye û ew hertim hîlbijartinê baykot dikin. Endam û alîgirên wan jî deng nadin. Lê tevî ku hin xelk ji ber tirsê bêparbûn ji xizmetguzariyên gund û bajaran di hîlbijartinan de beşdar dibin, lê dîsa jî asta beşdariyê li gora hejmara akinciyên navçeyên cuda yê Rojhilatê welat kêmtir e. Di hemû hîlbijartinan de Kurdên nêzikî hikûmetê, soza bicîkirina mafên Kurdan didin wan. Lê piştî hîlbijartinê hemû tê jibîrkirin. Kincên Kurdî, stran û çanda wan ji bo berjewendiya aliyê hikûmî tê bikaranîn.

Nan û mastê Koronayê bo Spaha Pasdaran e



N: Serbest Urmiye

Di mijara xwe ya hejmara berê de min hindê li dor vîrûsa Koronayê û mifahwergirtina rejîma îranê ji vîrûsê anî bû ber bas. Ji wan valakirina destê Spaha Pasdaran ku hêzeke serkutkar û bi tevahî di bin emrê mîrê serkutkar ê rejîme wate Xameyeyî de ye. Hindî ku eşkere ye, di qada siyaset û aboriya Îrana di bin destê Komara Îslamî de, Spaha Pasdaran wekî rêxistîneke berfihêh û xwedî desthilat, rola sereke dibîne û bê îzna wê helên siyasetê û siyasetên aborî di Îranê de nameşin.

Spaha Pasdaran yek ji wan organên sereke ye ku di eslên 150 û 151'an yên destûra bingehîn a Komara Îslamî ya Îranê de hatiye pesendkirin û desthilat wergirtiye. Li gor esla 150'an ya vîrûsê, Spaha Pasdaran bi navê teva "Spahê Pasdaranê Enqîlabê Êslamî ê Îran" wate hêza parêzvan a Şoreşa Îslamî ya Îranê, hatiye şirovekirin. Di esla 151'an ya heman destûrê de ji bi hikmê ayeta 60'an ya sûreta Enfal a Qurana pîroz, hikim jê re hatiye diyarîkirin û desthilat jê re hatiye dean ku ji bo parastina rejîmê ji hemû hêz û derfetekê mifahê werbigire.

Di heman demê de û li gor eslên 5 û 110'an yên destûra bingehîn a rejîma Îranê, rêberê rejîmê desthilat bi ser hemû demudezgehên rejîmê de heye û fermandarê giştî yê hemû hezên çekdar ên rejîmê ye. Ku di vir de û li gor yasayê, Spah pitir dikeve

berçav û ya ku heya niha hatî kirin jî vîrûsê dide selimandin ku Spaha Pasdaran hêza yekem a parêzerê rejîmê û cihê hêviya rêberên rejîmê bûye. Lewma heta derfet li ber rejîmê tengav dibin, destê Spaha Pasdaran pitir tê valakirin.

Berî bilavbûna vîrûsa koronayê û heya îro ku koronayê aboriya cîhanê bi giştî û ya rejîmê bi taybetî ber bi rûyê tehlûkeyên nû kiriye, li mêj ve ye ku bi sedema siyasetên navokî yên rejîmê û kiriyarên terorîstî yên Spaha Pasdaran a rejîmê, dorpeçên cur bi cur nemaze di warê aborî de ji aliyê civaka navneteweyî û nemaze Amerîkayê ve bi ser Îranê de hatine sepandin, bi awayekî ku aboriya rejîma Îranê ber bi rewşeke gellek xirabtir ji ya ku dihat texmînkirin de biriye.

Piştî hatina belaya koronayê jî, daxistina sînoran ji aliyê welatên derdor di ser Îranê de û bi merema kontorolkirina koranê ku ji aliye rejîma Îranê ve çî hewilek nedihat dîtin, nizimbûna bihayê niftê di bazarên cîhanî de û... hwd, rewşeke wiha di Îranê de pêk aniyê ku rejîm li hember dabînkirina hewcehiyên saxlemiyê ku îro bo civaka korona girtiya Îranê ji her tiştî pitir hewce ne, neçar bimîne an ku wisa nîşan bide ku neçar maye. Helbet ji aliyeke din ve rejîm mifahê ji vîrûsê werdigire ku bala cîhanê bikişîne ser Îranê û bikare di vîrûsê de kiriza aborî ya ku bi sedema dorpeçên cîhanî ser Îranê de heye, heke bi yekcarî neyê hilûşandin, aliyê kêma heya qasekê sivik bike. Her çend ku neçariya rejîmê li hember dabînkirina emrazên saxlemiyê bi taybetî bo îro rojê, bi çî awayekê nahên qebûlîkin. Ji ber ku derman û xizmetên saxlemiyê di dorpeçên cîhanî li ser Îranê de nehatine baskirin. Ji aliyeke din ve îdiayên rejîmê bo alîkariya Amerîka û welatên derdor bo di warên pizîşkî û emrazên kontirolkirina koronayê, pitir rûyê derevîn yê rejîmê dide



eşkerekirin.

Di rewşeke wiha de bê guman hikûmet bi tev organê xwe ve, rastî qeyrana kêrhatîbûn û bêhitbarbûnê tê. Di rewşek wiha de jî ku pêsira rejîma Îranê bigire, organa yekem a xwedî hêz û emrazê yekem yê hikimdariya rejîmê Spaha Pasdaran e. Bêhitbarbûna hêza han jî rejîmê ber bi rûyê hîlbijartinên dijwar dike. Lewma rêberê rejîmê ku li gor destûra bingehîn him desthilata îdarî û him ji fermandarê giştî yê hêzên çekdar e û Spah jî baskê bihêz yê parastina rejîmê ye, neçar dike ku li pey rêyên derbasbûnê ji qeyranê bigire. Divê ku ew hemû hewla xwe bide ku li gor felsefeya Îslamî ya "ca'el heq û zeheq_el batil" (wate serkevtin bo heqaniyetê û şikest bo niheqiyê ye) ku rejîm peyrew dike, hêza han ku felsefeya wê serkevtin bi ser neyarên Îslam û rejîma Îslamî de ye û ji bo damezrandina wê ji Quran, pertûka pîroz a misilmanan mifah hatiye wergirtin, ji qeyranê derbas bike û hertim wekî hêza pêşeng di baweriya mezhebî ya xelkê Îranê de bide xuyakirin.

Çî guman di vîrûsê de nine ku rêberê rejîmê bi taybetî piştî gotinên xwe yên çend rojên borî derheq nexwşiya koronayê de ku dibêje hegera vîrûsê hindê zor e ku korona wekî çeka biyolojîkî li dijî Îranê hatibe bikaranîn û destûr da ku serokê navenda hevbeş ya hêzên çekdar ên rejîmê ku endam û yek ji birêveberê Spaha Pasdaran e jî, navenda berhingarbûne li dijî koronayê ava bike, hewil dide dîsa role sereke bide

hêza di bin emrê xwe de û her derfetek ku di wê derheqê de bi qazancê xelkê were dayîn, dîsan bikeve bin destê Spahê de. Hekî ne, hekî meriv bal bikişîne ser wan gotinên Xameneyî :

1. Li gor destûra xameneyî, divê "Qerargah" were damezrandin. Em tev dizanin ku "Qerargah" li îranê pitir di warê leşkerî de tê bikaranîn, wate cih an erdek ku hêzên leşkerî tê de akingî ne.

2. Di rewşeke wiha de ku pêsira xelkê girtiye û heta diçe hegera serhildana qeyrana mirovî di Îran û cîhanê de xurttir dibe, û di demekê de ku rejîma Îranê îdiayê dike xwedî hêza zaniştî di warê saxlemiyê de ye û amadeye alîkariya welatên din jî bike, çima tekez li ser navendên zaniştî, zanişt û pisporên saxlemiyê di welat de nahê kirin û erkdar nahên kirin. Eva serbarê ve hindê ye ku tê dîtin hemû welatên pêşketî yên cîhanê zanişt, taqîgehên zaniştî û pisporên xwe yên di warê dermançêkirin û saxlemiyê de bo vîrûsê pirsar girîng erkdar kirine.

Belê xuya ye ku dîsan hewil tê dayîn destê Spaha Pasdaran vala bê kirin ku him piştî derbasbûn ji qeyranê Spah wekî hêza Îlahî û rizgarker di bawera xelkê de were cihkirin û him jî hemû derfetên ku ji aliyê civaka cîhanî ve ku ji bo berhingariya vîrûsê belayê ji Îranê re tên dayîn, Spaha Pasdaran bi der de bê zalkirin û bi keyfa xwe qazancê jê bibe. Nemaze ku heya niha bi qaseke zaf alîkariya diravî ji aliyê çend welatan ve ji Îranê re hatiye şandin.

“Meryem Xan Qazî” keça “Qazî Mihemed” koça dawî kir

Meryem Xan Qazî, keça “Pêşewa Qazî Mihemed”, bi sedema nexweşiya şêrpence li “Eman” paytexta Ordonê çû ser dîlovaniya xwe.

Roja Yekşemî, 25`ê Reşeme a 1398`an (15`ê Adar a 2020`an), “Meryem Xan Qazî” keça “Pêşewa Qazî Mihemed”, bi sedema nexweşiya şêrpence di temenê 73 salî de di yek ji nexweşxanê bajarê Eman a paytexta welatê Ordonê de koça dawî kir.

Meryem Xan Qazî hevjinê “Serdar Begê Caf” bû û yekek ji bihelwestên Kurd û emegdar bi rêbaza bavê xwe û armancên PDKÎ bû û heşt û sozeke taybet bo xebatkarên



gelê Kurd hebû.

Meryem Xan Qazî li çendîn bûyerên dilêş digel Partiya Pêşewa heşt û soza xwe nîşan da. Dema ku nûçeya şehîdbûna rêberê mezên ê gelê Kurd şehîd “Dr. Qasimlo” gihîştê, deset avêt bi qîrîn û hawar kirin û gotibû bavê min şehîd bû. Yan jî di dema dermankirina desteyek ji pêşmergekên PDKÎ li Bexdayê ku di jêr çavdêriya pizîşkan de bûn Meryem Xan û malabata wê bi berdewam alîkariya wan dikirin.

Meryem Xan tevê vê ku di jiyana xwe de gelek aştengî dîtî gelek caran jî rastê awrebûn û derbideriyê bû, lê ti carî

ew dijiwariyên jiyanê li ser îradeya nîştimanperwerî ya xwe nedana û bi hêvî bûnê mîzeyê jiyan û xebata gelê xwe dikir.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê sersaxiyê dibêje malbata Pêşewayê mezin ê me Qazî Mihemed û nemaze “Elî Qazî” birayê Meryem xan û xwişkên wê û “Dawûd Xaf” kurê “Serdar Caf û Meryem Xanim” û xwişkên wê, û hêvî dike ku riha Meryem Xanê di nav Beheştê zerîn de şad be.

Rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

26`ê Reşeme a 1398`an
16`ê Adar a 2020`an

Rejîma Îranê gefan li çalakvanên medenî di Rojhilata Kurdistanê de dixwe

Çalakvanên medenî û xelkê xwebexiş di bajarên Rojhilatê Kurdistanê de, bona paqijkirina û dijegendkirina bajaran, wan hemû hewlên xwe didin ku pêşî ji belavbûna vîrûsa Koronayê bigirin.

Roja Pêncşem 29`ê Reşemê Çalakvanên medenî yên bajarê Şinoyê baskirine, ku ji aliyê rejîma Îranê ve gefa bi wan dixwin ku mafê wê yekê nînin ku kar û çalakiyên

xwe medyayî bikin û nabe ragihandinên derve agehdarî wan çalakiyan bin, û heke we ragihandinên derve agehdarî çalakiyên xwe kirin dibe bibêjin ku dezgeh û saziyên rejîma Îranê ew xizmet bo xelkê kirine.

Çalakvanên medenî û xelkê sivil yên xwebexiş, bi pere û keda xwe dest bi paqijkirina gund û bajaran dikin, lê rejîma Îranê tevî ku ti alîkari-



yekî bi wan nade, hin car jî wan rastî pirsgerêkên cor bi

cor dikin û gefan ji wan dixwin, di bajarê “Şino” û hin gundên girêdayê wî bajarî de, wekî gundê “Çeşme Gul” û herwisa di gundê “Merzîng” a de vera “Çemê Mecîdxan” a girêdayê bajarê “Merîwan”ê de, û li bajara “Mihabad”ê de jî, çalakiyên paqijkirina û dijegendkirina cihên giştî, kolan, şeqam û taxan, bona parastina xelkê ji tûşbûnê wê nexweşiyê bi rê ve birin.

Xelkê Kurdistanê xwe û bajarên xwe qerentîne dikin

Pişî hatina vîrûsa Koronayê di Îran û Kurdistanê de, welatîyên Kurdistanê dema ku mîze kirin rejîm ti hewlekî nade ji bo pêşgirtina vîrûsê û dijegemarkerina gund û bajaran, bi xwe dest bi kar bûn û bajarên xwe dijegemar û qerentîne dikin.

Di gelek gund û bajarên Urmîyê de, welatîyan bi awayekî xwebexş kolan û şeqam dijegemar kirin û çavniherê navendên rejîmê neman.

Li bajarê Şinoyê “Saziya Jînkoyê”, bi awayê xwebexiş



besteyên alîkariyê bi xelkê wî bajarî re didan ku di malên

xwe de neyêne derê û xwe di malên xwe de qerentîne bikin.

Li de vera Şarwêran a ser bi bajarê Mehabadê jî, welatîyan pişî ji hemû hatûçûyekê girtin û ew devere bi awayekî giştî qerentîne kirine.

Li bajarê Seqizê jî, xelkê dilsoz bi xwe mask û kincê çê dikin û di nav xelkê de belav dikin.

Du bajarên Pawe û Ciwanro jî, ji aliyê xelkê ve hatine qerentînekirin û herwisa bazara bajarê Rewanserê jî roja Yekşemî bi awayekî giştî hate daxistin.

Çavên Zehrayê nabînin lê xwedî behreyeke huneriya bihêz e

Zehra Şêxî yan jî Zehra Berkil keçeke nabîn e, ji bajarokê Şêranê yê ser herêma Kobanî ve ye, tevî ku ew bi ronahiya çavan dinyayê nabîne, lê hezkirina wê ya ji ziman û çanda Kurdî re, hîştîye ku ew xwedî behreyeke huneriya bi hêz be.

Zehra Şêxî him li tembûrê dixê û him jî ştranan dibêje û him jî zimanê wê yê Kurdî, ji gelek kesên bi çavan tîp û gotinan dibînin baştir e, û xweş bi zimanê Kurdî diaxive û baş têdighe.

Zehra Berkil a 38 salî ji Rûdawê re wiha behsa xwe dike: “Ez û xwişka xwe herdû nabînin, ez ştrana dibêjim, lê xwişka min nabêje. Em di malê de heft xwişk û du bira bûn. Herdu birayên min zewicin, yek derket Ewroyê, yên din jî cîranê min e. Xwişkên me hemû zewicin. Min xwe fêrî ştranan Şivan Perwer kir. Ez ştranan Eyşe Şan û Faris jî dibêjim lê zêdetir ên Şivan Perwer dibêjim.” Deng û awazên Zehra Berkil sînore malê derbas dîkin û dost mirovên wê gelek caran



li dora wê kom dibin û guhdariya ştrana û tembûra wê dîkin.

Zehra Berkil herwiha got: “Ez dixwazim ştranan çêbikim û xwe di warê muzikê de pêşbixim. Ji dema zarokatiya min ve meraqa min li ser ştranan ştranan Şivan Perwer hebû û niha hêviya min ew e ku rojekê Şivan bibînim.”

Bi gotina Zehra xewna wê ew e ku kesek lê xwedî derbikeve û ew di warê hunerê de xwe pêş bixe. RÛDAW

Kurdekî li Stenbolê bi karê “xetat”iyê binavûdeng bûye

Li bajarê Stenbolê Xetadê Kurd Mihemedxan Akan demeke dirêj bi karê xetadiyê ve têkildar bûye û ew niha bûye kesekî binavûdeng.

Xetad ew kesin ku bi nivîseke delal karê nivîsandinê dîkin û vê yekê bi hurgiliya hunerekê dîkin. Ew tevî demeke dûvûdirêj xwe digihînin astekekê û ji bo vê hunera hêja ew cûr bi cûr amûran bikar tînin ku hin ji wan pêncûs, kasikên hibrê û hibir bixwe ye. Bi saya vê ked û sebrê wan berhemên giranbûha afirandine û ew berhem bi sedan salan le ber xwe dane û gihîştine roja me.

Hunera xettê ji sedsala 6emîn destpêkiriye û heta roja me ji gelek merhaleyan derbas bûye. Ev huner ji Erebiştanê bigrin heta Herat, Îsfexan û Tebrîzê di erdnîgariyeke berfireh ya Îslamê de ji xwe re cih girtiye.

Stenbol jî ku nêzikî 500 sal payîtextiya Osmaniyan kiriye navendeke gelekî girîng e ji bo hunera xet û Xetadiyê. Wek ku tê gotin Quran li Mekkeyê daketiye, li Misrê hatiye xwendin û li Stenbolê hatiye nivîsin. Ev jî nîşaneyê girîngiya vî bajarî ye ku cihekî wê yê taybet heye di vê hunerê de.

Mihemedxan Akan ji



Rûdawê re wiha behsa xwe dike: “Di sala 1964an de li bajarê Amedê li navçeya Farqînê hatime dinyayê. Min dibistana seretayî û navendî li wir xwend. Ev nêzikî 10 sal e ku ez li ser hunera xetê ders didim. Wek ku hunêro dibînin şagirtên me jî li ber destê me ilm û îrfanê hîn dibin. Di karê me de nesîh heye, sulus heye, rîqa heye, dîwanî heye û kûfî heye. 6 fontên wê hene. Ev 6 font jî îro li Tirkîye û Stenbolê bi giranî têne bikaranîn. Herwiha em wan di fêrgeha xwe de jî dişixwilînin. Xwendevanên me bi giranî bi nesîhê destpêdîkin. Ew fonta Quranê ye û bi vî hawî fêrî xwendina wê dibin. Dûre ez wan hînî rîqa û sulusê dikim.”

Xetad Mihemedxan her roj li kargeha xwe ya li navçeya Eyubê tevî xwendekarên xwe dicive û ew aliyên bêhempa ya hunera xwe yek bi yek nîşanî şagirtên xwe dide. Ji her derê bajêr xwendekar diçin ba mamoste Mihemedxan ji bo hînî wê hunera taybet bibin û xwe di wê hunerê de bipêş bixin. Armanca wan ew e ku xwe di wê kevneşopîya bav û kalan de bigihînin astekekê û wê berdewam bikin. Dibe ku ew ji her temenî an pişeyî bin.

Xanenişîn Abdûllah Tûnç jî got: “Min xwest hem wextê xwe yê vala dagrim û hem jî ev zimanê kitêba me ya pîroz e. Eleqeyê min a germ heye ji bo Quranê, lewma min xwest bi awayekî ilmî xwe fêrî nivîsandina wê bikim. Ji bo wê ez li vî fêrgehê me. Di heman demê de ji bo nivîsa delal ez dersên kalîgrafiyê jî distînim. Dixwazim her 2an bi hev re hîn bibim. Di encamê de ez xwe fêrî kelama rebbê alemîn dikim ku ew jî bo însanan şandiye. Armanca hatina min ev e.”

Beşdarê kursê Yunus Emre jî dibêje: “Ez li Eyubê dijîm û karê bazirganiyê dikim. Bi saya mamoste Mihemedxan ez hay ji karê kalîgrafiyê bûm. Berî ku ez mamoste nas bikim min di pirtûkekê de xwendibû ku di navbera xulkiyeta kesana û nivîsa wan de têkiliyeke xurt heye. Dûre min bi xwe nivîsekê nivîsî û ew hîç li xweşa min neçû. Min jî xwe pirs kir û got gelo pirs-girêk di çî de ye, belkî pirs-girêk ya min bi xwe be û divê ez wê sereraşt bikim. Ez bi armanca hobi û xwe bipêşxistinê tîm vî fêrgehê. Xwedê ji mamosteyê me razî be, hem bi kesayetiya xwe û hem jî bi dersên ku dide me bawerim dê me gelekî bipêş bixe.

Di destpêkê de ev hunereke destnivîsa Ereban bûye lê piştê ji aliyê tevahiya gelên Îslamê ve ev huner hatiye pejirandin û bûye weke nirxeke hevbeş. Ev hunera destan di wextê Împaratoriya Osmaniyan de dema xwe ya zêrîn jiyaye û niha jî bi saya kesayetiyên mîna Mihemedxan ve hem tê berdewam kirin û hem jî tê vejandin. RÛDAW

Binpêkirinên mafê mirov li meha Reşeme ya Îsal di Rojhilatê Kurdistanê de

Dadgehê biryara xwe bo “Mujgan Kawûsî” ragihand

Dadgeha pêdaçûn a parêzgeha Mazenderanê nerizayeti û dakokiya “Mujgan Kawûsî”, nivîskar û çalakvana Kurd a Yarisanî bi parêzeriya “Mîstefa Nîlî” red kiriye û biryara dawî di ser wê çalakvana Yarisanî de sepand.

Di wê derheqê de Mujgan Kawûsî, li ser rûpela xwe ya Îniştagramê nivîsiye: “Dadgeha pêdaçûnê, daxwazkariyên Dozgerê Giştî û înkîlaba bajarê Newşehrê bi biryara rewşa zaniye”.

Ew çalakvana Yarisanî nivîsiye: “Herwisa cezaya hepsiyên ku bi piropagendeyên dijî nizamê hatine girtin, li şeş mehan bo heft meh û nîvan, handana xelkê bona têkdana nezma giştî li 30 mehan bo 36 mehan hatiye guherîn. Cezaya hepsiyên ku bi tohmata endambûn digel girûpên dijberî hikûmetê her wekî xwe 33 meh e û bi vê hesabê, berhevkirina cezayê hepsîbûna min ji 69 mehan kirine 76.5 meh û herwisa cezayên giran ku berê li cihê endambûn di partiyan de bûye, niha cihê xwe daye handana xelkê bi dijayetîkirina hikûmetê.

Ew nivîskara Kurd ragihandiye: “Ji berku pêka yasaya berhevkirinê, cezayê herî giran tê cîbicîkirin, cezayê girtina min ji 33 mehan bû bi 36 mehan, wate bi 3 salên tewaw hate guherîn”.

Hêzên kinc şexsî ciwanekî xelkê bajarê Sineyê binçav kirin

Roja Pêncşemî 22`ê Reşemê, ciwanekî Kurd yê bi navê “Xebat Mihemedî” xelkê bajarê Sineyê, ji aliyê hêzên kinc şexsî ve hate binçavkirinê.

Ew ciwanê Kurd, piştî binçavkirinê bo cihekî nexuya hatiye veguhaştin û ji qedera wî ti zanyariyek ji ber deşt nîne.

Hêzên kinc şexsî ew ciwanê Kurd bi tohmata “endamê yek ji Partiyên dijberê hikumeta Îranê” binçav kirine.

Binçavkirina wî ciwanê Kurd, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî bûye û heya niha li pey ketina malbata Mihemedî bo agehdarbûn ji qedera kurê xwe bê encam bûye.

Di girtîgeha bajarê Urmîyê de pêşî ji tedawiya pizîşkî a hepsiyekî hatiye girtin

Hepsiyek bi navê “Dawûd Qasimzade” kurê Feysel û xelkê bajarê Selmasê, bi sedema pêşîgirtina berpîrsên girtîgeha navendî a bajarê Urmîyê, bo tedawiya pizîşkî bo dereveyê girtîgehê bê par kirine.

Ew hepsiye digel birayê xwe yê bi navê “Bihadîn Qasimzade” nêzî 11 sal e bi tohmata kuştina bi zanebûn di girtîgehê de ne. Çavkaniyeke agehdar di wê derheqê de got: “Ew hepsiye çend roj beriya niha, ji aliyê pizîşkê pispore ve tedawiya pizîşkî kiribûn û pizîşk biryara neştegeriya wî hepsiyê di dereveyê girtîgehê de dabû, lê berpîrsên girtîgehê pêşîya tedawiya pizîşkî a navbira di dereveyê girtîgehê de girtine.

Herwisa wê çavkaniyê eve jî got: “Îro Şemî 24`ê Reşemê, birayê wî hepsiyê, bi nîşaneyê nerizayetiya rewşa ku niha têde ye, petûya xwe agir berbayê û daxwaza pêregihîştina rewşa dijwar a cêsteyî ya birayê xwe kiribû ku ew du hepsî ji aliyê me`imûrên girtîgehê ve hatine îşkencekirin.

Ew du bira, piştî îşkencekirina zêde ji aliyê me`imûrên girtîgehê ve, bo odeya takekesî hatine veguhaştin û heya niha li odeya takekesî a girtîgeha bajarê Urmîyê de ne.

Welatîyekî Kurd bi hegera teqîna gullexumpareyekê canê xwe ji deşt da

Roja Duşemî 26`ê Reşemê, welatîyekî Kurd bi navê “Keywan E`zemî” temen 37 salî û xelkê gundê “Kilêne” a bajarê Serpêl Zehawê, bi sedema teqîna gule xumpareyekî di cihde mayî a şerê 8 sale a Îraq û Îranê, bi sedema kurahiya birînan canê xwe ji deşt da.

Ew bûyera, roja yekşemî 25`ê reşemê çêbû Roja piştî hingê anku Duşemiyê wî welatîyî bi sedema kurahiya birînan li nexweşxaneyê canê xwe ji deşt da.

Piştî derbasbûna zêdetir ji sê dehikan bi ser dawî hatina şerê Îran û Îraqê, deverên çandî bi mîn û alavên şer li Kurdistanê, bi berdewamî canê welatîyan dibe qurbanî û heya niha rejîma Îranê, ti pêngavek bo paqij kirina wan deverên mîn rêj nehavêtiye her wisa Kurdistan û Herêmen Sinûrî tejbîne ji Mîn û Teqemenî.

Parêzvanên Jiyanê



Parêzvanên Jiyanê

Dibe em di hizra xwe û welatê xwe de bin

